Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1219 6-Mijdar-2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# Bi karê xwe yê hesinkariyê qalibên civakî dişkîne



**Fatma Şemo ya 60 salî û ji ber dagirkeriya dewleta Tirk berê xwe daye Şehbayê û bi karê hesinkariyê qalibên civakê yên der barê jinan de dişkîne.**

Li Şehbayê ku xelkê Efrînê yê ji ber dagirkeriya dewleta Tirk koçber bûne lê dijîn û di heman demê de di bin rêgirî û ambargoya hikûmeta Şamê de ye, jin di hemû qadên jiyanê de têdikoşin. Fatma Şemo ya 60 salî ku piştî êrişên dewleta Tirk a li ser Efrînê koçberî Şehbayê bûye, bala herkesî bi karê xwe



yê hesinkariyê dikşîne. Fatma Şemo zêdetirî 30 salane bi hevjînê xwe re karê hesinkariyê dike.

Fatma Şemo anî ziman ku hê ji beriya çend salan dema li Efrînê dijiyan ew bi hevjînê xwe re dikaneke çibûlk li ber mala xwe vekirine û li wir dest bi karê hesinkariyê kiriye. Fatma Şemo wiha domand: "Çend salan me di hundirê malê de kar kir û me zarokên xwe jî fêrî vî karî kir. Alavên ku me çêdikirin li bazara Efrînê difrotin heta ku beşa pîşesazî vebû. Îcar wê demê me dikanek di hundirê cihê pêşesaziyê de vekir ji bo em alavên xwe bifiroşin. Jin eger xwedî vîn be dikare xwe li her derê isbat bike, ji ber jin xwedî hêzeke xurt e û li hember irf û adatên kevnare bisekine."

## Jiyana koçberiyê

Fatma Şemo di berdewamiya axaftina xwe de behsa azarên koçberiyê û bandora wê li ser karê wê kir û wiha pê de çû: "Mirov dema ji cih û warê xwe koçber dibe êş û azar duqat dibin. Ji ber derfetên jiyanî zehmet e û me her tişt li Efrînê hişt û niha li Şehbayê dorpêçeke giran heye. Ji ber wê yekê em zehmetiyan di peydakirina pêwîstiyên karê xwe de dibînin. Lê belê em bi îradeyeke xurt li hember hemû rewşan disekinin heta em vegerin ser cih û warên xwe."

## 'Min bi îradeya xwe hemû zehmetî derbas kirin'

Fatma Şemo bal kişand ser vê yekê ku ew di civakek wisa de dijî ku ferq û cudahiyê dixe navbera jin û mêran de û wiha gotinê xwe bi dawî dike: "Lê belê ez rojekê jî bi vê yekê bandor nebûm ji ber min rol û misyona jinan di nav civakê de dizanîbû. Bi îradeya xwe min û hevjînê xwe û ji bo em zihniyeta ku jinan paşguh dike têk bibin hemû zehmetî derbas kirin. Karê hesinkariyê ne tenê li ser jinan zehmet e, lê belê li ser mêran jî bi taybet piştî temenek mezin wisa ye. Tevî ku ewqasî zehmet e jî lê em wê weke sporekê ji bedena xwe re dibînin. Ez bang li hemû jinan li hemû cîhanê dikim ku li dijî zihniyeta desthilatdar bisekinin û rola jinan di civakê de xurt bikin." **NÛ JINHA**

# Şîlan hevaltiya gulan dike

**Dilovan Kêfo/ Amûdê**

**Mamosteya zimanê kurdî Şîlan Mûsa ku ji bajarê Amûdê ye, ji zaroktiya xwe ve ji kulîlik û gulan hez dike, niha jî ştilgeheke gulan ava kiriye û karê çandin û firotina gulan dike.**

Jinên herema Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di pergala netawa demokratîk de êdî dikarin gelek têgehên civakî bişkînin û di her qadê de rola xwe ya pêşengtiyê bileyîzin. Herwiha ji bo pêşxistina aboriyê jin karên taybet pêşdixin û bi rêya wê debara jiyana xwe dikin.

Yek ji jinên ku bi riya çandina gulan û firtona wan debara jiyana xwe dike, Şîlan Mûsa ye.

Şîlan Mûsa jineke 25 salî, ji bajarê Amûdê ye. Wê ji zaroktiya xwe ve ji kulîlik û gulan hez dikir û hewil dida ku herdem li derdora xwe gulan biçîne. Piştî ku Çîlan Mezin bû dest bi pirojeyek taybet kir û şitilgeheke gulan li bajarê Amûdê ava kir. Şîlan bi rêya çandin û firotina gulan jîngehê bedew dike û debara jiyana xwe dike. Ji bo serxistina karê wê ji destpêkê û heta niha ,herdem malanbat û hevalên wê piştgirî û alîkariya wê dikin.

Derbarê karê çandin û firotina gulan, Şîlan Mûsa ji rojnameya me re axivî.


Şîlan di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Ji bû ku bihtir karên min belav bibe, min dest bi belavkirina karê xwe li ser



medyaya civakî kir.Piştî wê karê min yê firotina gulan belav bû û ji gelek kesan jî pişgirî ji min re hat û gul zêdetir hatin firotin."

Şîlan di derbarê cureyên gulan yên ku difiroşe, herwiha zehmetiyên ku tên pêşiya wê wiha got: "Çureyên sereke yên kulîlik û gulan ku ez difroşim û civak jê hez dike; Tolîb, lazaniya, zembeq, reyhan, corî ne. Karê min rastî gelek zehmetiyan bû, mîna cihekî taybet ji bû danîna gulan û zehmetiya anîna gulan ji cihên dûr, lê ev zehmetî li pêşiya vîna min rabûn, bi demê re karên min pêş ket û zehmetî jî kêm bûn."

Şîlan Mûsa bang tevahiya jinan kir ku xwedî li jêhatî û berhemdariyê xwe, xwedî derkevin û axaftina xwe wiha qedand: "Ne tenê şitigeha min heye, ez mamostêya zimanê kurdî me û zarokan jî fêr dikim. Ez ji tevahiya jinan dixwazim ku xwedî li jêhatî û karên xwe derkevin, xwe pêşxin û zehmetiyan derbas bikin. Pêwîste jin guh nede nerînên neyênî û xeyalên xwe pêk bîne."




Bi kamîreya ronahî



Kampa Waşûkanî

## Li dijî desteserkirina şaredariyan gel li ser piyan e

Piştî desteserkirina Şaredariyên Mêrdîn, Batman û Xilfetiyê ji aliyê hikumeta faşîst a AKP-MHP'ê ve, gelê kurd li Bakurê Kurdistanê rabû ser piyan û helwseta xwe ya parastina îradeya xwe nîşan da. Herwiha seredestkirina şaredariyan bû rojeva raya giştî ya cîhanî û bû cihê şermezariyê.**R-3**



## 'Dagirkeriyê 21 milyon dar birîne û 9 hezar kes revandine'

Rêveberê Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê, Ibrahîm Şêxo da zanîn ku dewleta Tirk û komên çete ji destpêkirina dagirkirina Efrînê ve heta niha 21 milyon dar birîne û 9 hezar welatiyên resen binçav kirine. Herwiha Şêxo dest nîşan kir ku dagirkerî nahêle welatî berhemên xwe rakin û budceyên mezin li ser wan ferz dike.**R-5**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1219 6-Mijdar-2024 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## Avabûn, sembol û armancên Kongra Star...(1)



Kongra Star deskeftiyeke jinê ya pîroz e ku di encama ked û xebateke bêhempa de bendên tundweriyê û desmala tarîtiya ku bi hezarên salan sîstemên desthilatdar avêtibû ser gewd û hişmendiya jinê, hatin rakirin, ava bûye.**R-2**

# BÊDENGIYA HIKUMETA ŞAMÊ REWAKIRINA DAGIRKERIYÊ YE

Dewleta Tirk a dagirker bi êrişên xwe yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê serweriya xaka Sûriyê binpê dike, ewlehiya herêmê dixe xeteriyê û qirkirina gelan pêk tîne. Lê hikumeta Şamê van êrişan paşguh dike û dosyaya dagirkeriya Tirk û êrişên wê yên domdar li ser xaka Sûriyê naxe rojeveke navneteweyî. Ew bi bêdengiya xwe, dagirkirina xaka Sûriyê rewa dike.**R-4**



## 'Wê rapirsînek têkildarî rewşa tendurstiyê çêbibe'

Çav

Rêveberê Navenda Çav a Rapirsînan, Silêman Ilyas da zanîn ku rapirsînên ku hatin çêkirin, hin guhertin bi xwe re anîn. Herwiha Ilyas eşkere kir ku wê rapirsîn girêdayî rewşa tendurstiyê û xizmeta Rêveberiya Xweser a di vî warî de, were çêkirin.**R-6**

## Ji tûrikê Salihê Heydo; 4 çîrok diyarî wêjeya kurdî



Folklornas û lêkolîner Salihê Heydo, îsal 4 pirtûkên çîrokî çap kirin, ew çîrok jî, dîroka civaka kurdî ya rasteqînî bi rengekî wêjeyî û xemilandî vedibêjin. Herwiha li gel van berheman çîrokeke din û dîwaneke wî li ber çapê ye.**R-7**

Jinê bê nirx dikin — Nehîr pale R-2

Divê mirov ji pêşerojê qut nebe — Zekî Bedran R-5



Têkoşîna Yusuf Ziya û Abdullah Ocalan — Farûk Sakik R-5

# Avabûn, sembol û armancên Kongra Star...(1)

Kongra Star deskeftiyeke jinê ya pîroz e ku di encama ked û xebateke bêhempa de bendên tundweriyê û desmala tarîtiya ku bi hezarên salan sîstemên desthilatdar avêtibû ser gewd û hişmendiya jinê, hatin rakirin, ava bûye.

**Navenda Nûçeyan**




Ew weke rêxistinek avanî ya konfederala demokratîk a jinê ye ku ji bo wekhevî û azadiya wê têkoşînê dike. Ev rêxistin weke destkeftiyeke mezin li ser hîmê Neteweya Demokratîk bi saya Rêber Apo Kongra Star û jinên azadîxwaz di 15'ê Çileya 2005'an bi navê Yekîtiya Star li Rojavayê Kurdistanê bi kongreyekê hate damezrandin. Bi navê Yekîtiya Star, heya sala 2016'an kar û xebat kiriye, di heman salê de navê kongreyê lê hat kirin. Kongra Star her du salan kongreyên xwe li dar dixe.

**Sembola wê:**

Li ser zemîna kesk di nêviya wê de roj, li aliyê çepê ê rojê simbil û aliyê wê yê rastê tîrêjên rojê, di nava rojê aliyê çepê de nîv ruyeke jinê ya bi rengê sor ku li tîrêjên rojê dinêre, heye.

**Dîroka jinê, zayendperest û li hemberî wê jî ramanên Rêber Apo**

Herêma Rojhilata Navîn weke dergûşa mirovahî û şaristaniyan tê naskirin, ji ber ku ev herêm bûye şahidê gelek şoreşan, weke şoreşa neolîtîk ku îro jî mirovahî li ser jiyan dike. Hêza sereke bû di pêkhatina civakê de û dabînkirina ewlehiyê ji bo komê û birêvebirina kar û barên wê bêyî ku pişta xwe milkan bispêre mal û milkan. Lewra ew wek xweda dihatin dîtin. Lê belê bi zayîna sîstemên dewleta otorîter re ku li gorî destavêtina nirxên jinan û dizîna fêkiyên keda wan ji aliyê zilam ve hatine avakirin, jin bi xwe, zarokên wê û mîrateyên wê yên madî û razberî têne desteserkirin. Herwiha statûya pîrozî û xwedawendiya jinê tê xirakirin û bi dîmenên ku bi kincên mîtolojîk û olî hatine pêçandin heta derketina zihniyeta kapîtalîst bi awayên herî hovane ji holê radike. Ji ber vê yekê pirsgirêkên civakî di astên ciddî yên wekî tundî, şer, kolonyalîzm, zayendî, ol, neteweperestî û qeyran, pirsgirêk û pirsgirêkên din derdikevin holê. Li cihê ku pergala baviksalarî ya otorîter her tişt li derdora xwe hilweşand û veguherand û bû mîna berfê ku carinan mezin dibe û diwerime û mîna gulek agirê ku jîngeh, xweza û jiyanê vediguherîne rewşek bê tehemûl ku di demên din de bijî û bimîne. Gelek nirx û serpêhatiyên çandî yên hevpar ên gelan ên, bi hezaran sal berê derketine holê, ji herêmê hatin derxistin, rakirin, tunekirin û ji holê rabûne. Tevî derketina gelek tevgerên dijminê rêjîmên otorîter, ew bi ser neketin û di dawiyê de ketin nexweşiya desthilatdarî û lîstikên dewletê. Ji ber ku cewhera kanserê ya desthilatdariyê nedîtin û diyardeya dewletê rast analîz kirin. Ji derveyî paradîgmaya dewlet û desthilatdariyê paradîgmayeke têkoşînê ya stratejîk ava dike, bi vî rengî hemû şoreş bûne xayîn, ji bo armancên xwe yên wekhevî, azadî û demokrasiyê. Lê belê Rêber û ramanwer Abdullah Ocalan guherîna paradîgmatîk ku paradîgmaya civaka demokratîk a ekolojîk e ku ji aliyê zayendî ve tê azadkirin, pêk anî û ji bo vê bi gotina "Jina azad tê wateya civaka azad û civaka azad, neteweya demokratîk e) tekoşîneke bêhempa afrand. Bi saya vê yekê jinên li Rojhilata Navîn bi taybetî li Kurdistanê bûn xwedî zanebûn, hişmendî û îradeya azad û karîbûn rêxistinbûna xwe ava bikin û bi hişmendiyeke îdeolojîk xwe li hemberî hemû pêkanînên dewletî, derûnî û baviksalarî bi çek bikin. Ji bo avakirina sîstemeke şaristaniya demokratîk ku weke hêzên teorîk û pratîk ên ji bo rawestandina qirkirina jinan û civakan, parastina jiyanê ye, bikeve nava hêza têkoşînê. Jin bi saya vê mîrateyê di asta rewşenbîrî, ezmûna pratîkî ya ku bi dest xistine û bi kûrahiya rêxistinî ya ku bi rêxistinbûna xwe di hemû sazî û rêxistinên di bin banê xwe de bi dest xistiye, bûne pêşengê şoreşa Rojava li Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Sîwana Kongra Star bû û karîbûn di nava hemû tevgerên jinan ên herêmê de çalakiyên hevpar pêş bixin û bû hêza sereke ya demokratîkbûna Rojhilata Navîn.

**Armancên Kongra Star**

Kongra Star li her derî û bi awayeke giştî li ser rêgezên vîna cewherî û xwerêvebirinê bi tevahiya jinên gelên ku xwediyê çand, ziman, baweriyên cuda ne, di nava piştevaniyeke hevpar de ye xwe birêxistin dike. Li ser bingehên Netewa Demokratîk navendîbûnê derbas dike û bi cudawaziya gelan û jinan re bi esasgirtina edalet, azadî û wekheviyê xwe rêxistin dike .Li ser bingehê paradîgmaya Demokratîk-Ekolojîk û Azadixwaziya Jinê rêxistin dike. bi bergeha nêrîn û bîrdoziya jinê çareseriya pirsgirêkên civakê esas digire. Di tevahiya qadên jiyanê de bi perspektîfa Konfederalîzma Demokratîk birêxistin dike. Li beramberî tevahiya nêzîkbûnên ku çavkaniya xwe ji pergala zilamê serdest û feraseta ku rê li ber zayendperestî, nîjadperestî, deshilatperestî û tundiyê vedike, têkoşîn dike. Ji bo ku vîna jinê di her qadên jiyanê de bibe hêza biryarê, tevahiya xebatan li ser bingehê hevserokatiyê û bi rêgeza nûnertiya wekhev dide meşandin. Pêşengtiya rêxistinbûna modela civaka demokratîk a li ser bingehê komun û meclîsan dike. Pêşengtiya modela azadî û wekheviyê ya ku bi şoreşa Rojava (şoreşa jinê) derketiye holê, da ku vesaziya Sûriye û Rojhilata Navîn li ser bingehên demokratîk pêk were û deskeftiyên gelê Kurd û gelên din were parastin û pêşxistin. Kongra Star, rêbazên xwe yên rêxistinbûn û têkoşînê dispêre zanista jiyana azad Jineolojiyê,hişmendiya jina azad, jiyana azad û têkoşîna zayend pêşdixîne. Li ser bingehê perspektîfa Hevjiyana Azad despêkê di nav malbatê de, di têkiliyên jin-mêr de û di tevahiya têkiliyên civakî de li dijî, deshilatperestî û zayendperestiyê têkoşîn dike û hewl dide ku demokratîkbûna mêr û malbatê pêk were. Kongra star. jibo guhertin û veguhertina hişmendya mêr têdikoşe. Ji bo avakirna malbateke demokratîk li ser asasên wekhevî , adalet, xewşkbûn ,û azadiyê kar dike. Kongra star jibo avakirina kesayetek azad perwerdekirina zarokan liser asasê berpirsiyariya civakî u naskirina zayendî û rêzgirtin û azadiya hişmedî. Birêvedibe. Li dijî êrîş û vesaziyên zilamê serwer ,xweparastin û jiyana wekhev dixe navenda xwe,û pêşdixe. Li dijî her cûre bişaftin û qirkirinên çandî û fizîkî û dagirkerî û mêtîngeriyê têkoşîn dike. Nirxên civakî yên komunal ên jinê û mafê hebûna çandî û fizîkî ya gelan diparêze.

## Ji Pênûsa Jin

### Jinê bê nirx dikin

**Nehîr Pale**

Gelek nêzîkatî, feraset, têgeh, peyv û pênaseyên ji bo jinê têne kirin wê bê nirx dikin. Di bin navê exlaq û kevneşopî de hebûna jinê tê inkar kirin, di mejiyê jinê de hatiye çandin ku ciyê wê tenê li mutfexê ye, ev tê wateya ku ciyê wê di siyasetê, dîplomasî, rêveberî, parastin û hwd tine ye. Zayendperestî jin kiriye namûs, şerefa civakê û rêbazên ku civak li beramberî jinê dide bikar anîn wê gelekî tengav dike. Malbat li gorî xwe her tim dixwaze namûsa xwe biparêze û tu gotin li ser wan neyê gotin, ji ber vê yekê dikarin her kesî û bi taybet jinê bikin qurban. Jin jî li beramberî vê yekê bêdeng dimîn in. Bav di têkiliya xwe ya bi keçên xwe re weke jin li wan nanêre, mulkê wî ne û ji wan re dibêje `Kurê` min. Ji xwe keç dema dibînin malbat cûdahiyê dixe navbera jin û mêr de êdî weke jin gelekî ji xwe acizin, her tim dixwazin bibin lawik, êdî bi lawikan re diçin û tên, mîna wan li xwe dikin, tevgerkirina wan jî dibe mîna lawikan. Li civata jinan rûnanin û her mêr ji xwe re mînak dibîn in. Ev yek dibe sedema ku jin were bê nirx kirin.
Her wiha gotineke pîşeyan heye dibêje` Xema keçikan heyanî mirinê ye`, ango dixwazin bibêjin her tim jin bar e, ji ber zeyîfe nikare berpirsyartiya xwe rabike, divê her tim mêr wê biparêz e. Tu carî bawerî nadin jinê ku ew xwe birêve bibe, berpirsyartiya xwe rabike yan jî bikaribe ji bo xwe biryar bigre.
Rêbazê jinê ji carekê zêdetir bizewcîn in gelekî kirête û nirxê jinê namîne. Jina hevjînê wê miriye, jina ew û hevjînê xwe li hevdû nekirine û têkiliya xwe qut kirine, jina bavê wê miribe û hwd. Zewacê ji wan re çareserî dibîn in. Ango bi zewacê re mêr berpirsyartiya wan radike û dibe stara wan. Mêr eger bibe stara jinê ev tê wateya nirx û qîmeta jinê nîne.
Di olê Islamê de dibêjin `Buhişt di bin lingê dayîkan de ye` dibe ku bi riya wê dixwazin rêz ji bo dayîkê were dayîn, ji xwe dayîk mîna ku jine lê nayê nêrîn. Niha nirxê dayîkan jî nemaye. Piştî dayîk hemû zarokên xwe mezin dike, bi salan xizmeta wan dike û xwe fedayî wan dike pir rehet dev jê ber didin. Dikarin wê li kolanan bihêlin, wê bar li ser xwe dihêlin, di vê rewşê de eger keç xwedî li dayîk û bavê xwe dernekeve wê bê xwedî bimîn in. Bi sedan jin li gel dayîk û bavê xwe dimîn in, ji wan dûrnakevin heyanî ku dimrin. Civak ev yek jî bênirx kiriye, difikirin ku jin tê dunyayê da ku xizmeta mêr û bavê xwe bike, weke dîtir tiştek jê nayê xwestin. Jin heyanî ku saxbe wê tenê xizmetê bike, lê nayê nêrîn ku ew insane û dibe azad bijî, her tim koletiyê layiqî wê dibîn in. Hemû rêbazên ku jinê bê nirx dike didin bikar anîn.



# Ji tûrikê Salihê Heydo; 4 çîrok diyarî wêjeya kurdî

Folklornas û lêkolîner Salihê Heydo, îsal 4 pirtûkên çîrokî çap kirin, ew çîrok jî, dîroka civaka kurdî ya rasteqînî bi rengekî wêjeyî û xemilandî vedibêjin. Herwiha li gel van berheman çîrokeke din û dîwaneke wî li ber çapê ye.

**Navenda Nûçeyan**

Salihê Heydo folklornas, lêkolîner, nivîskar û helbestvanê kurd e ku di sala 1956'an, de li gundê Hesê Oso yê girêdayî bajarê Amûdê ji dayîk bûye. Ew di roja heyî de xwedî 86 berheman e, berhemên wî yên nû ku di pêşangeha Şehîd Herekol a pirtûkan a 8'an de hatin îmzerkirin jî 4 bûn ew jî ev in: Hin Mînak û Gotin Bi Çîrok û Şîrovekirin, Fitlek Zerazeng Ji Buhara Gulreng, Rîhan û Nefel Ji Mêrga Gel û Hin Kul û Derdên Giran ji Seferberlika Xopan.
Têkildarî naveroka van pirtûkan jî nivîskarê wan Salihê Heydo ji rojnameya me re axivî.

**Berhema Hin Mînak û Gotin Bi Çîrok û Şîrovekirin**

Salihê Heydo têkldarî çîroka xwe ya bi navê Hin Mînak û Gotin Bi Çîrok û Şîrovekirin, wiha anî ser ziman: "Ev pirtûka min li ser gotinên pêşiyan û metelokên gelêrî ye, wekî em dizanin ku bi hezaran mînak û pend di nava kurdan de tê gotin, lê civaka me wateya wan nizane. Her metelokeke kurdî û gotineke pêşiyan xwedî wateyeke kûr û çîrokeke. Herwiha pir gotin û metelok hene, tên gotin û wate hem jî dîroka wan nayê zanîn, pê re jî çîroka wan jî nuximandî dimîne. Ev berhem 85 metelok tevî çîroka wan digire nava xwe, min ji destpêka sala 2024'an ve dest bi nivîsandina wê kir û îsal li Weşanxaneya Şilêr hat çapkirin. Min xwest ku li van gotinên pêşiyan û metelokan bigerim, berhevkariya wan bikim û piştre jî şîrove bikim. Armanca min ji nivîsîna wê, ew bû ku dema mirovek li civatekê be û metelokek li wê civatê were gotin, bi awayekî yekser wateya wê, çîrok û dîroka wê nas bike. Ji ber ku ev metelok beşeke girîng in ji wêjeya civakê min ev berhem piştî kedeke mezin û lêkolîneke berfireh tevî zehmetiyan, amade kir."

**Fitlek Zerazeng Ji Buhara Gulreng**

Heydo derbarê pirtûka xwe ya bi navê Fitlek Zerazeng Ji Buhara Gulreng wiha got: " Naveroka pirtûka Filtek Zerazeng Ji Buhara Gulreng li ser çîrokên gelêrî ye. Zerazeng jî tê wateya zencîra pîvok û gula, di rabirduyê de civaka kurd ew gul ji zeviyan diçinîn, dihûnandin û dikirin qirika xwe. Min ev nav li pirtûka xwe kiriye û hûnandina çîrokên kurdî mînandiye bi fitla zerazengan, buhara gulreng jî gelê kurd e. Pirtûka min 45 çîrokên civaka kurdî vedibêje, ev çîrok rasteqînî ne, ji jîwariya gelê me ne. Min piştî amadekirina berhema Hin Mînak û Gotin Bi Çîrok û Şîrovekirin, dest bi nivîsandina wê kir û di heman salê de li Çapxaniya Dilav çap kiriye. Min piraniya van çîrokan, bi çavên xwe dîtine û ez di nav wan de jiyame. Heriwha min lêkolîn jî çêkirin, pê re jî gelek çîrok ji wan hene, min di mejiyê xwe de hiştibûn û heya dema wan hat, min ew nivîsandin. Mijarên çîrokan cihêreng in, hin xemgînî ne, hin şadwerî ne û hin jî komîdî ne. Çîrokên di pirtûkê de, dîroka salên




1960'î heya îsal jî vedibêje. Armanca min ew bû ku bûyerên balkêş yên ku min dîtine û dîroka jiyana civaka xwe bi belge bikim, da ku nifşên siberojê dîroka xwe nas bikin."

**Rîhan û Nefel Ji Mêrga Gel**

Lêkolîner Salihê Heydo pirtûka Rîhan û Nefel Ji Mêrga Gel wiha nasand:" Ev pirtûk bireke ji çîrokên rastînî yên gelê kurd yê herêma me ne. Pirtûk ji 23 çîrokan pêk tê, min dîroka gelê kurd bi bêhna rîhan û nefelê mînandiye û civak jî bi mêrgeke daye destnîşankirin. Piraniya çîrokan bûyer û serpêhariyên gelê kurd in û hem jî çîrokên ku taybet bi min re çêbûne. Çîrokêm ku min nivîsandine, mirov dikare sûdê jê bigire, ji ber ku mirovan fêrî sinc û rewştên baş dike. Bi awayekî wêjeyî raman, hizrandin, û danûstandina civakê di vê pirtûkê de bi çîrokî tê vegotin. Min ev berhem piştî lêkolînekê di havîna îsal de nivîsand û li Çapxaneya Dilav çap kir."

**Hin Kul û Derdên Giran Ji Seferberlika Xopan**

Heydo girêdayî pirtûka Hin Kul û Derdên Giran Ji Seferberlika Xopan wisa axivî: "Ev berhem jî çîrokeke gelêrî, ji rastiya civaka me ya kurdî ye. Di navbera salên 1912'an heya 1917'an de şer derket di navbera împratoriya Rûsî û Osmanî de. Di wê demê de împratoriya Osmanî gelê kurd yê belengaz û hejar bi darê zorê ji bo şerê li hember Rûsiya dibirin seferberlikê. Herwiha yê ku diçû seferberlikê jî venedigeriya welatê xwe, yan dihat kuştin yan der bi der diman. Êdî min hin kes ji wan ên ku diçûn seferberlikê û saxlem mabûn, dîtin û çîroka seferberlika wan, astengî û êşa ku pêrgî wan bûne bi giştî nivîsandine. Ji wan kesên ku min ew dîtibûn, Hecî Ibrahîmê Ebdelle bû, di salên 1960'î de min ew dîtibû. Hejmara wan kesên ku min çîroka wan di vê pirtûkê de bi cih kirine, nêzî 10 kesan in. Ev berhem jî bi riya neviyê Ûsê Mio li çapxaneya Dilav hate çapkirin, Ûsê Mio kesayetek bû çîroka seferberlika wî di vê pirtûkê de tê hewandin. Çîrokên hemû kesan di mejiyê min de ma bûn, tevî dîrokên tekûz jî ji bûyerên rasteqînî yên ku bi kurdên Rojava re çêbûne di vê pirtûkê hatine nivîsandin.

**Tûrikê berhemdayîna Salihê Heydo vala nabe…**

Salihê Heydo derbarê berhemên ku wê di dema pêş de werin çapkirin wiha eşkere kir: " Ev her çar berhemên ku ez li ser wan axivîm, tev jî di pêşangeha Herekol hatin beşdarkirin û şahiya îmzekirinê çêbû. Lê ji bilî van pirtûkan 2 pirtûkên din hene, yek jê çîrok e û ya din jî helbest e. Çîroka ku nehatiye çapkirin gelêrî ye, dîwan jî, helbestên cihêreng digire nava xwe, weke êşa gelê kurd, welatparêzî, evînî, mijarên civakî û hwd... Ez wekî nivîskar, lêkolîner û folklornas, hetanî ku kurd hebin û ez hebim, dê hertim xebatê ji bo wêje, çand, ziman, folkolor û civaka kurdî xebatê bikim. Ji ber ku miletê kurd bi hezarên salan ji çanda xwe ziman, wêje û dîroka kurdî hatiye qedexekirin. Berhemên min ên ku di dema pêş de derkevin, wê di xizmeta çand, wêje, ziman û folklora kurdî de bin. Gelek tişt hîna li gel min hene û hîna min nenivîsandine, ji ber wê jî dibe ku hejmara pirtûkên min di sala 2025'an de bighêjin 90 pirtûkî.

# Li Rojava rewşa perwerdeya bi zimanê zikmakî

**Rizoyê Xerzî**

Perwerdeya zimanê kurdî li Rojavayê Kurdistanê ji dersên bi dizî li malan dihatin dayîn dest pê kir niha perwerdeya bi zimanê kurdî li zêdeyî 4 hezar dibistanan tên dayîn.
Piştî salên 90'î li Rojavayê Kurdistanê ji bo perwerdeya bi zimanê zikmakî hin hewldan çêbûn û bi rengekî veşartî me li malan bi dizî zarok kom dikirin û li malan ew hînî xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî dikir.
Di navbera salên 1996 heta 1999'an de ez bi xwe yek ji wan kesan bûm ku tev li wê hemleyê bûm, min bi dehan komên zarokan li malan hînî xwendin û nivîsandina kurdî kir. Wê demê hin kesên ku em dişopandin û tenê henekê xwe bi me dikirin digotin: "Her wiha filankeso çend zarok kom kirine û wê ji wan re safî bike." Hinekan wiha qerfên xwe bi me dikirin lê kesên ku zarokên xwe dispartin me ne wiha difikirîn û wan guh dida girîngiya perwerdeya bi



zimanê zikmakî.
Bi rastî ez nikarim navê perwerdeyê lê bikin ji ber ku wê gavê tu mufredatek li ber destê me tune bû û her mamosteyekî li gorî zanîna xwe ew zarok hînî xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî dikirin. Lê piştî şoreşê me jî û wan kesên qerfê xwe jî bi me dikirin nû nas kir û ew pêngava hînkirina zarokan çiqasî giring bû. Gelek ji wan zarokên ku bi rengekî veşarî li malan hînî xwendin û nivîsandina kurdî bibûn piştî şoreşê hewcedariya bi wan kesan derkete holê. Piraniya wan kesan bûn mamoste û pêşengên perwerdeya zimanê zikmakî. Piştî şoreşa 19'ê Tîrmehê di warê ziman û perwerdeyê de jî gavên mezin hatin avêtin û şoreşek di wî warî de jî hate destpêkirin.
Pêngava herî girîng jî di dema 19'ê Tîrmehê de me dest bi karên ji bo perwerde û ziman kir. Saziya Zimanê Kurd (SZK) di vir de bi roleke girîng rabû. Ji aliyê perwerdekirina mamosteyan, avakirina sîstema perwerdeyê ve karên girîng hatin kirin.

**Mufredata Rêveberiya Xweser**

Di salên 2015 û 2016'an de li Efrîn û Kobanê ji pola destpêkê heta pola sêyemîn bi mufredata Rêveberiya Xweser perwerde hate dayîn. Li Cizîrê ji pola destpêkê heta pola duyemîn. Li Cizîrê di dema perwerdeyê ya 2016 û 2017'an de mufredata Rêveberiya Xweser heta pola 6'emîn hate dayin. Li Kobanê û Efrînê jî derbasî pola 12'an bû. Di sala 2017-2018'an de li Cizîrê ji pola 6'emîn heta pola 12'emîn derbasî mufredata Rêveberiya Xweser bû. ji sala 2015'an heta 2018'an mufredata Rêveberiya Xweser derbasî hemû dibistanan bû. Pergala perwedeyê ya ku bi şoreşa 19'ê Tîrmehê re li Rojava bi kedeke mezin hate afirandin, heta bê vê astê gelek zor û zehmetî dît. Pêvajoya perwerdeyê ya ku li malan bi kûrsên bi dizî dest pê kir di bin sîwana Rêveberiya Xweser de bi mufredata xweser bi 3 zimanan dewam dike.
Îca ji bo ew kesên ku qerf û henekên xwe wê demê bi hewldanên hînkirina zarokan di wan kursên ziman de dikirin, ez vê agahiyê bidim wan bes e: Niha li tevahiya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê 860 hezar û 729 xwendekar hene. Li şûna wan çend malên ku bi dizî me di wan de kursên ziman didan zarokan niha 4 hezar û 798 dibistan hene. Li şûna wan çend mamosteyên ku bi dilsozî zarok hînî ziman dikirin niha zêdeyî 42 hezar mamoste hene. Her wiha li van dibistanan ne tenê bi zimanê kurdî, bi zimanê erebî û suryanî jî, bi sê zimanan xwendekar perwerdeyê dibînin.

# ‘Wê rapirsînek têkildarî rewşa tendurstiyê çêbibe’

Rêveberê Navenda Çav a Rapirsînan, Silêman Ilyas da zanîn ku rapirsînên ku hatin çêkirin, hin guhertin bi xwe re anîn. Herwiha Ilyas eşkere kir ku wê rapirsîn girêdayî rewşa tendurstiyê û xizmeta Rêveberiya Xweser a di vî warî de, were çêkirin.

**Navenda Nûçeyan**

Navenda Çav a Rapirsînan îsal di çarçoveya kar û xebata xwe de, 4 rapirsîn çêkir. Yek ji wan rapirsînan li ser rewşa diyalog û hevrêziya kurdî bû, ya din derbarê komînan de bû. Di heman demê de li ser mijara dadewerî û hem jî girêdayî rewşa perwerdeyê rapirsîn hatin çêkirin.
Di derbarê van rapirsînan de Rêveberê Navenda Çav a Rapirsîna, Silêman Ilyas ji Rojnameya me re axivî.



**‘Rapirsîn girîng û watedar e’**

Silêman Ilyas da zanîn ku rapirsîn ji bo çaksazkirina pirsgirêkên heyî girîng û watedar in û wiha anî ser ziman: “ Wekî em dizanin di dawiya sala bûrî de me weke Navenda Çav a Rapirsînan damezirand, lê di destpêka sala 2024’an de em daketin nav qada xebatê. Ji wê demê heta niha me 4 rapirsîn çêkirin. Ji ber ku rapirsîn roleke mezn ji bo diyarkirina nerîna civakê di derbarê mijareke taybet de dilîze. Herwiha ew ji bo çareserkirina pirsgirêkên cuda girîng û watedar e. Rapirsîn bi hemû pêkhateyên civakî re hat çêkirin. Di destpêkê de li ser rola komînê di rêveberirin û rêxistinkirina civakê de rapirsîn li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê hat çêkirin. Nêzî 12 pirsan ji civakê hatin kirin û nerîna nêzî hezar kesan hat girtin. Piştre jî rapirsîn li ser rewşa perwerdeyî hat çêkirin û tê de pirsên cihêreng ji 990 kesî li ser asta herêmê bi giştî hatin kirin. Herwiha me bi rapirsîneke nerîna welatiyên Qamişlo ji bo diyaloga kurdî girt. 321 kesî bersivên curbecur dan ji bo vê yekê. Herî dawî jî me rapirsînek di derbarê sîstema dadgehê û pêkanîna wekheviyê de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê çêkir. Tê de jî nerîna 750 welatî û parêzer û hwd… hat girtin. ”

**‘Civak bi metirsî nêzî pêvajoya rapirsînê dibe’**

Ilyas destnîşan kir ku rapirsîn li gorî ku tê xwestin tên çêkirin lê civak bi tirs nêz dibe û wiha domand: “Em weke Navenda Rapirsînan, alava derxistina nerîna civakê derbarê mijareke girîn ji bo gihandina dengê civakê ji Rêveberiya Xweser re. Ji ber vê yekê jî rewşa civakê çi be em wê derdixin holê. Piştî ku rapirsîn çêbûn, li gorî şopandina me, hin guhertin pêk hatin, di serî de li ser asta perwerdeyê. Em dibînin ku bi destpêkirina sala xwendinê ya dibistanan re guhertin kete biranşên perwerdeyî. Herwiha Desteya Perwerde û Fêrkirinê jî gav bi gav êdî biranşên her sê qonaxên dibistanê diguherîne. Lê em ji hêlekê ve rastî astengiyan dibin. Ew jî di pêvajoya rapirsînê de ye, civaka me û tevahiya gelên Rojhilata Navînin di warê rapirsînan de lawaz in. Dema ku me rapirsîn çêdirin, piraniya civakê bi metrsî nerîna xwe digotin. Yan jî digotin ev rapirsîn guhertinê û tu encaman bi dest nexe.”

**‘Dê rapirsîn li ser rewşa tendurstiyê were çêkirin’**

Rêveberê Navenda Çav a Rapirsînan, Silêman Ilyas diyar kir ku wê girêdayî rewşa tendurstiyê, rapirsînek di dema pêş de çêbibe û wiha got: “Armanca me ji rapirsînan, çareserkirina pirsgirêkên heyî di nav saziyên Rêveberiya Xweser de ye. Em têkildarî xalên lawaz di nav xebata saziyên Rêveberiya Xweser de nerîn û rapirsîna civakê digirin û encaman ji her kesî re didin xuyakirin. Pê re jî çi diyardeya ku di rojevê de be li gorî girîngbûna wê rapirsînan çêdikin. Em li ser 5 girûp in li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Rapirsîn bi riya teknîk û bernameya taybet û pêşketî tên çêkirin. Xebata me berdewam e û wê îsal rapirsîneke din were çêkirin. Rapirsîna ku em ê li ser kar bikin di derbarê mijara tendurstiyê de ye. Em ê nerîna civakê di derbarê xizmetguzariya tendurstî ya ku Rêveberiya Xweser ji bo civakê pêşkêş dike de, rapirsînekê çêkin.”

# ‘Berhema pembo ya îsal xwedî cureyeke baş e’

**Yasmîn Omo / Hesekê**

**Hevserokê Saziya Giştî ya Pembo, Mistefa Ibrahîm diyar kir ku berhemê pembo yê îsal xwedî cure û berhemdayîneke başe. Herwiha birahîm da xuyakirin ku texmîn dikin ku îsal nêzî 75 hezar ton pembo ji cotkaran bê wergirtin.**



Pembo yek ji girîngtirîn cureyên çandiyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye ku cotkar lê kêleka çandiniya ceh û genim wê jî diçînin.
Saziya Giştî ya Pembo ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo wergirtina pembo ji cotkaran sê navend li Hesekê, Dêrazorê û Reqayê vekir. Di 1’ê Cotmehê de Saziya Giştî ya Pembo dest bi wergirtina pembo ji cotkaran bi buhayê 600 dolar ji yek tonê re, kir . Li gorî Desteya Çandinî û Avdanê ev bûhayê pembo li beramberî lêçûna madî ji bo cotkaran guncawe.

Di derbarê mijarê de hevseroka Saziya Giştî ya Pembo li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Mistefa Birahîm ji Rojnameya mere axivî.

Mistefa Birahîm di destpêka axaftin xwe wiha got: ‘‘Saziya Giştî ya Pembo li herêma Bkaur û Rojhilatê Sûriyê ji bo wergirtina berhema pembo ji cotkaran beriya dema wergirtinê bi 3 mehan hazrtî jê re kirin. Li devrên ku pembo tê çandin wekî heskê , Dêra Zorê û Reqayê navendên wergirtina pembo ji cotkaran hatin vekirin. Van her sê navendan di 1’ê Cotmehê de destt bi wergirtina pembo ji cotkaran kir. Li gorî lêkolînên ku hatine kirin tê texmênkirin nêzî 75 hezar ton pembo ji cotkaran were wergirtin. Hûşa yekem ya pembo bi giştî wê ji cotkaran were wergirtin, lê heta niha nediyare ka wê hûşa duyemîn bê wergirtin yan. Ev jî di demên pêş de wê bê zelalkirin.”

Ibrahîm di dewama axaftina xwe de wiha got: “Wergirtina pembo ji cotkaran re hêsane. Cotkar serdanan yekîniyên Şêweriyê yên herêma xwe dike û belgeyê bi dest dixe, piştî wê dikare pemboyê xwe bêne navendên wergirtinê. Wergirtina Pembo ji cotkar zêde dem naxwe, rojek yan du rojan dirêj dike. Zehmetiyên ku em dibînin ew e ku hin caran bazirgan pemboyê xwedî cûreyên nebaş û yên baş li nav hev dixin û tînin ji me re, herwiha hin caran ji bo giranî zêde bibe pembo şil dikin û tînin navendên wergirtinê. Gelek cûreyên pembo hene, nirxê kirîna wê jî li gorî cûre, pilya şiliyê û paqijiya wê tê dayîn.”



Mistef Birahîm axaftina xwe wih bi dawî kir: ‘‘Li navdên wergirtina pembo ku me vekirine, tevahiya karmendên tê de kar diin perwerdekirî ne û karê xwe birêkûpêk dikin. Herwiha pemboyê ku em ji cotkaran werdigrin tê veçirandin û paqijkirin, piştî wê em pêdiviya gargehên xwe jê digrin, yê zêde dimîne jî bi riya Rêveberiya Xweser ji bo bazarê derve tê firotn. Bi giştî Îsal cûreyê pembo başe û berhema wê zêde ye, ji 1 donimî 350 kîlo heta 500 kîlo pembo tê berhemdayîn.



# Li dijî desteserkirina şaredariyan gel li ser piyane

Piştî desteserkirina Şaredariyên Mêrdîn, Batman û Xilfetiyê ji aliyê hikumeta faşîst a AKP-MHP’ê ve, gelê kurd li Bakurê Kurdistanê rabû ser piyan û helwseta xwe ya parastina îradeya xwe nîşan da. Herwiha seredestkirina şaredariyan bû rojeva raya giştî ya cîhanî û bû cihê şermezariyê.

**Navenda Nûçeyan**

Doh, 4 Mijdarê Wezareta Karên Hundir a dewleta Tirk a faşîst Li 3 şaredariyên Bakurê Kurdistanê qeyûm tayîn kir. Li Şaredariya Bajarê Mezin a Mêrdînê ya di bin rêveberiya Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (DEM Partî) de hikumeta faşîst ya AKP-MHP’ê qeyûm tayîn kir. Polîsan di saetên serê sibehê de avahiya şaredariyê dorpêç kirin. Herwiha li Şaredariya Êlihê jî qeyûm hate tayînkirin û avahiya şaredariyê ji hêla polîsan ve hate dorpêçkirin. Di heman demê de li Şaredariya Xelfetî ya Rihayê jî qeyûm hate tayînkirin. Di saetên zû yên serê sibehê de avahiya şaredariyê hate dorpêçkirin û hevşaredar Mehmet Karayilan hate binçavkirin.
Derbarê qeyûman de DEM Partiyê daxuyaniyeke nivîskî da.
DEM Partiyê tayînkirina qeyûm weke darbeyê pênase kir û got: “Balkêş e ku di salvegera darbeya Meclisê ya di 4’ê Mijdara 2016’an a li dijî îradeya gelê kurd hate kirin. Êrişên bi mebesta tesfiyekirina siyaseta demokratîk a gelê kurd de tên kirin, ji sala 1994’an heta niha didomin û îflas kiriye. Ya ku hatiye kirin tenê dubareya 30 salan e. Em careke din dibêjin ku ev êriş, darbeyeke eşkere ya li dijî îradeya gel e. Darbeyên qeyûman ên di demên berê de hatine kirin, ji hêla gel ve hatine redkirin, pratîka qeyûman di hilbijartinan de têkçûneke mezin xwarine û gelê me partiya me weke îradeya xwe destnîşan kir. Israrkirina di darbeya qeyûm de ku di her hilbjartinê de têk diçe, nîşaneya têkçûna siyasî ye. Îktîdara AKP-MHP’ê, şaredariyên ku nekariye bi rêya hilbijartinan bi dest bixe, hewl dide bi rêya daraz û hêzên ewlekariyê xesp bike. Ev yek ji xwe re kiriye hînbûnek. Û darbeya qeyûm veguherandiye rejîmekê. Ev êriş, di heman demê de êrişeke li dijî mafê bijartin û hilbijartinê yê gelê kurd e. Dorpêçkirina şaredariyan, veguherandine qereqolan û ev yek nîşan dide ku rejîma siyasî ya heyî rewabûna xwe ya demokratîk winda kiriye.
Di heman çarçoveyê de Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (DEM Partî) ji ber tayînkirina qeyûman, biryar da ku we hefteyekê tev li xebatên Meclisê nebe. Herwiha Piştî DEM Partiyê, CHP’ê jî biryar da ku tev li xebatên Meclisê nebe. CHP di heman demê de dê di tevahiya hefteyê de tev li xebatên Lijneya Giştî û xebatên komîsyonên din jî nebe.

**Berxwedana gel**

Li dijî tayînkirina qeyûman li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê gelê kurd rabû ser piyan û helwesta xwe ya li dijî wê nîşan de.
Li Êlihê ciwanan li hemberî desteserkirina şaredariyan tevahiya şevê li taxên cuda protestoyên xwe berdewam kirin. Ciwanan li taxên Karşiyaka, Petrolkent, Baglar û Cûdiyê rê girtin û li hemberî polîsên ku êrîş li wan dikirin, li ber xwe dan. Polîsan bi xaza îsotê, TOMA û guleyên plastîk êrîşî ciwanan kirin. Ciwanan li ser rêyan agir vêxistin û bi fîşekên hewayî bersiv dan polîsan.
Bertekên li dijî desteserkirina Şaredariya Bajarê Mezin A Mêrdînê, şaredariyên Êlîh û Xelfetî yên di bin rêveberiya Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (DEM Partî) de ne, zêde dibin. Polîsan êrîşî girseya ku li ber Şaredariya Bajarê Mezin a Mêrdînê çalakiya protestoyî pêk dianîn, kirin. Gel bi çepik û berzkirina dirûşmeyan bertek nîşanî polîsan da û nobeta



li ber şaredariyê didomînin.
Gel li dora agirê ku li ber şaredariyê hat pêxistin li hev kom bûn û bi stranan çalakiya xwe didomînin. Parlamentera DEM Partiyê ya Mêrdînê Bêrîtan Guneş der barê çalakiya nobetê de ev tişt anî ziman: “Di vê pêvajoya ku aştî tê axaftin de di nava gel de hêviyek çêbû. Ev cara sêyemîn e îradeya gel tê desteserkirin. Dîsa di salvegera 4’ê Mijdarê doza kumpazê ya li dijî HDP’ê de şaredariyên gel hatin desteserkirin. Ev jî nîşan dide ku dewlet plana xwe ya tinekirina gelê Kurd hîn didomîne. Ji ber vê yekê hemû gelê me îro li ber şaredariyê kom bûn û bertekên xwe anîn ziman.
Hêzên Ked, Aştî û Demokrasiyê yên Stenbolê jî, desteserkirina Şaredariya Esenyûrtê, Şaredariya Bajarê Mezin a Mêdînê, Şaredariya Êlih û Şaredariya Xelfetiyê bi çalakiyekê protesto kir. Çalakiya li qada Esenyûrtê hat lidarxistin de gelek kes tevlî bûn. Di çalakiyê de dirûşmeyên “Li dijî desteserkirinê em ê bi berxwedanê bi ser bikevin” û “Jin, Jiyan, Aazadî” hatin berzkirin.
Di heman çarçoveyê de Li Xelfetiyê ciwanan ber bi Şaredariya Xelfetiyê ve meşiyan. Di navbera ciwan û polîsan de gengeşe derket û ciwanan agirê berxwedanê li kolanan pêxistin.
Bi nebestê li dijî tayînkirina qeyûman li bajarên Serhedê û navçeya Cizîr a Şirnexê çalakiyên protestokirinê hatin lidarxistin.

# ‘Divê dezgehên parastina mafên rojnamevanan erkên xwe bi cih bînin’


**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Necezakririna sûcdarên ku rojnemevan û karmendên ragehandinê dikin armanc dihêle ku sûcên li dijî rojnemevanan zêdetir bibe. Rojnemevan Bêrîvan Qasim bang li saziyên têkildar kir ku ji bo parastina rojnemevanan êrkê xwe yê exlaqî pêk bînin.**

Di çarçoveya şer û pêvçûnan de ku li hin welatan rû dide, gelek rojnemevan û karmendên raghandinê rastî êriş, işkence, revandin û kuştinê tên. Ji bo gihandina rastiyê jiyana wan dikeve xeterê. Li hemberî wan kiryarên ku derheqê rojnemevan û karmendên ragehandinê pêk tên jî, sazî, destgeh û rêxistinên parastina mafê Mirovan bi erkê xwe ranabin û lo gorî berjewndiyên desthilatdaran tevdigerin.
Li gorî UNESCO di sala 2023`an de zêdetirî ji sedê 50 ji bûyerên kuştina rojnamevanan di herêmên ku alozî û şer di wan de hene pêk hatine. Herwiha di sala 2024’an de rêje bilindtir bûye.
Li gorî UNESCO di navbera salên 2006`an û 2024`an de, zêdetirî



hezar û 700 rojnamevan dema ku nûçe û agahî pêşkêş dikirin, hatine kuştin . Li gorî raporê diyar dike ku rêjeya kuştina rojnamevanan zêde bûye, herwiha rêjeya sûcên kuştina rojnamevanan yên ku bê çareserkirin mane ji sedî 85 ji sûcên ku ji sala 2006`an tomar kiribû. Ji ber neczakirina sûcdaran jî dibe sedem ku hejmar û binpêkirinan li dijî rojnamevanan zêdetir bibe. Di raporê de rastiyek bi fikar radixe ber çavan, ku ji sala 2017’an û vir ve hejmara rojnamegerên jin ên hatine kuştin gihiştiye asta herî bilind, piştî tomarkirina kuştina 14 rojnamegerên jin.



Li tevahiya Sûriyê jî ji ber rewşa aloziyê rojnemevan û karmendên ragehandinê rastî kiryarên dijmirovî tên. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî rojnemevan û karmendên ragehandinê herî zêde rastî êrişên dagirkeriya Tirk tên û dibin armanc. Li gorî daxuyaniya desteya şopndina rastiyê ya ji bo belgekirina binpêkirinên li dijî rojnemevanan ku di sala borî de hatibû damezrandin, li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji destpêka sala 2011`an heta niha 28 rojnamevan gihaştine asta şehadetê û herî zêde bûna hedefa êrişên dagirkeriya Tirk. Herwiha li seranserî Sûriyê ji destpêka kirîzê û heta niha zêdeyî 550 rojnemevan û karmendên ragehandinê hatine kuştin.
Derbarê mijarê de rojnamevan Bêrîvan Qasim ji rojnameya me re axivî.
Bêrîvan Qasim bal kişand ser hedfgirtina rojnemevanan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, herwiha kiryarên PDK’ê li dijî rojnemevanan û wiha domand: “Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagirkeriya Tirk rasterast rojnemevana dike armanc , li Başûr jî PDK’ê wan direvîne. PDK’ê ne tenê derheqê Silêman Ehmed de kiryarekî dijmirovî dike, ew derheqê tevahî rojnamevanên kurd de kiryarên bê ezlaqî dike.”
Bêrîvan Qasim hedefgirtina erebeya kenala Jin tv bi bîr anî ku çawa bû armanca balafirên dewleta Tirk a dagirker û di encama wê de karmendê Jin tv şehîd bû, nûçegihana wê jî bi giranî brîndr bû û wiha anî ziman: “Li Rojavayê Kurdistanê her dem rojnamevan rastî êrişan tê û dibin armanca dewleta Tirk û hevlbendên wê. Bi taybet PDK ku dixwazin dengê rastiyê qir bikin û sûcên wan ji cîhanê re neyên aşkere kirin, ji ber vê yekê her dem rojnamevanan dike hedef da ku dengê heqîqetê û siyaseta wan ya qirêj bê veşartin.”
Bêrîvan Qasim wiha got:”Em weke rojnamevan ji Rojavayê Kurdistanê her dem dengê heqîqetê bişopînin û rastiya qirêj ya dewleta Tirk derxînin pêş. Wekî jin bi taybetî jî ku her dem jinên li rojavayê kurdistanê rastî qirkirinekê tê ji hêla dewleta Tirk ve her dem em ê dengê jinê û heqîqeta wê derxînin pêş û em ê nehêlin rêjîmên desthilatdar rastiya jinê biçewisînin. “
Bêrîvan Qasim di dawî de wiha got:”Em bang li wan kesên ku ida dikin ku parastina mafên rojnamevanan dikin ku rekên xwe bi cih bînin. Gelek sazî û dezgehên parastina mafên rojnamevanan hene, qanûnên ku mafên parastina rojnamevanan hene ku çênabe kiryar der heqê rojnamevanan pêk bê, lê tevî van jî tu muhasebe ji kesên ku sûcan der heqê rojnamevana dike nayê kirin, divê ev dezghe bi rolên xwe rabin, da ku kiryarên der heqê rojnamevanan pêk tê bi dawî bibe.”

# ‘Bêdengiya hikumeta Şamê li hemberî êrişên Tirkiyê, dagirkeriyê rewa dike’

Hevseroka PYD’ê Perwîn Yûsif da zanîn ku dewleta Tirk bi hincetên derew êrişî gelên herêmê dike û got, Bêdengiya hikumeta Şamê û Komkara Erebî li hemberî êrişên dagirkeriya Tirk rewabûneke. Herwiha xeteriya vejînkirina çeteyên DAIŞ’ê li ser ewlehiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bêhtir dike.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Êrişên dewleta Tirk li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên dawîn weke hercarê li pêşiya hemû çavên cîhanê dihatin kirin. Tevî ku hêzên navnetewî weke Hêzên Koalisîyonê û Rûsya jî di vê herêmê de hene, pêvajoya êrişên dagirkeriya Tirk domdar bû û hîna jî didome. Hikumeta Şamê jî li hember van êrişên dijmirovî bêdeng û bêhelwest bû. Derbarê heman mijarê de, hevseroka Partiya Yekîtiya Demokrat(PYD), Perwîn Yûsif bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Li hemberî êrişên dawîn ên dagirkeriya Tirk li ser gel û binesaziya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bêdengiyek ji milê hikumeta Şamê hebû, gelo çima?**

Dewleta Tirk a dagirker ne cara yekem e ku bi vî rengî êrişî hermêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike. Lê belê ji destpêka şoreşa Rojava ve heta roja îro bi rêbazên cuda dagirkeriya Tirk êrişî gelên me kiriye. Herêma me jî parçeyek ji xaka Sûriyê ye. Qaşo hikumeta Şamê ji bo serweriya Sûriyê şer û bazaran dike, lê me dît çawa ku dema êrişên dagirkeriyê li ser herêma me çêbûn, ew çawa bêdeng ma. Rojane gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tên hedefgirtin, zarok, keç û xort şehîd dikevin. Herwiha bajarên me tên dagirkirin û guhertina demografîk her û her didome. Hikumeta Şamê jî li hemberî van kiryaran xwe bêdeng dike û ew di rewşa temaşekariyê de ye, sedema vê yekê jî ji ber lawazbûn û bêbersivmayîna hikumeta Şamê ji banga aştî, aramî û yekbûyîna xaka Sûriyê ye. Bi vî rengî tê xuyakirin ku ew bêçare ye ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê û di heman demê de pirsgirêkên gelan di serî de pirsa gelê kurd heye, divê were çareskirin. Li aliyekî din ve jî gelek pirsgirêkên sîstemê bi xwe hene. Bi bêdengiya li hember êriş û kiriyarên dagirkeriya Tirk jî, tê tekezkirin ku ew bêhêz e.

**Kiryarên dewleta Tirk ên weke guhertina demografîk û êrişên hova li pêşiya çavên hikumeta Şamê û Komkara Erebî pêk tên, lê tu caran ew nebûne xwedî helwest li hemberî van êrişan, hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

Êrişên dagirkeriya Tirk, dûrî pîvanên mirovî û exlaqî tên kirin, tu caran nayên qebûlkirin. Ji ber ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê sîstemeke



xweser hatiye avakirin, gelên wê bi derfetên heyî, xwe bi rê ve dibin. Li nik wê jî, hêza parastinê erka xwe pêk tîne. Tu caran jî ev hêz nebûye kelem û amûreke xeternak ji dewletên hawîrdorê re. Lê ji destpêka şoreşa Rojava ve dewleta Tirk a dagirker, bûye kelem li hemberî şoreşê û Rêveberiya Xweser. Herdem çeteyên DAIŞ’ê ji aliyê sînorê dewleta Tirk a dagirker ve derbasî herêma me bûne. Di heman demê de bi sedên belgeyan di destê me de hene ku piraniya êrişên DAIŞ’ê yên li ser herêmên me, bi hevkariya dagirkeriya Tirk çêbûne. Lê em dibînin ku dewleta Tirk bi hincetên derw êrişî gel û binesaziya Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike. Komkara Erebî, saziyên navnetewî û hikumeta Şamê ji hêla xwe ve li hemberî êrişan bêdeng mane. Bêdengbûna wan dihêle ku êriş bêhtir bibin û ev bêdengî nakeve xizmeta çareserkirina kirîza Sûriyê. Lê belê kirîz gurtir dibe û rewabûnekê dide êrişên dagirkeriya Tirk. Li gel wê jî metirsiya



hebûn û vejînkirina çeteyên DAIŞ’ê li herêmê bêhtir bibe.

**Da ku kiryarên dagirkeriya Tirk bi dawî bibin û serweriya Sûriyê were parastin, pêwîste çi were kirin?**

Bê guman Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek bangewazî û hewldan ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê kirine. Di heman demê de diyaloga ji bo bidawîkirina kirîzê bi hikumeta Şamê re ranewestandiye. Çi hikumeta Şamê be yan jî hêzên Muxalfetê bin, me hewldanên diyalogê ji bo çareserkirina krîza Sûriyê kirin. Em dizanin hetanî ku dagirkerî li ser axa Sûriyê bi dawî bibe, pirsgirêka Sûriyê çareser bibe û aramî li herêmê pêk were, hewcedarî bi diyaloga sûrî-sûrî heye. Lê heya niha tu helwesteke rast û erênî ji aliyê wan ve nehatiye kirin. Ji ber ku hikumeta Şamê û hêzên Muxalfetê ji bo çareserkirina pirsgirêka gelên Sûriyê bêelternatîf in. Da ku Sûriyeke demokratîk û nenavendî çêbibe em weke partiya PYD’ê tevî hemû partiyên di nava Rêveberiya Xweser de herdem deriyê me ji diyalogê re vekrî ye. Di heman demê de tekez dikin ku wê çareserî bi danûstendinên sûrî-sûrî pêk were. Lê li aliyê din pêwîste hikumeta Şamê ji bêdengiya xwe derkeve û bibe xwedî helwest ji bo parastina serweriya axa Sûriyê. Herwiha divê gelên Sûriyê li hemberî van êrişan hevgirtina xwe bihêztir bikin, ji bo ku xwedî li şoreş û destkeftiyên xwe derkevin.

# Li vî welatî ‘Gurên Boz’ dibin ‘Nemrût’ Ev der Kurdistan e!

**Volqan Elî**

Ergenekon!..Xwendekarên dîroka gelê Tirk hinekê bihîstibin, bizanin wê were bîra wan ku ev destaneke êl û hozên Tirk e. Ji ber ku rasterast mijara me ne ev e, em ê kurt lê bidin. Werhasil, li gorî destanê hozeke pêşiyên Tirkan dema di koçberiyê de ye li çiyayekî asê dimîne. Çiyayên sext û asê rê nadin ku ew bi rêya xwe biçin. Gurekî Boz dikeve pêşiya wan û wan digihîne saxlemiyê. Ji vê bi şunde êlên Tirk, gurên boz ji xwe re pîroz dihesibînin.

Na, kêmasî û şaşitiyek yan jî tiştekî ku mirov li vê derê biçûk bibîne, tine! Kêmasî, biçûkbûn û dermirovî di nêzîkbûna netewe-dewletên faşîst de ye. Ew çi dikin? Eger gotin di cihê wê de be, ji ta heta bi derziyê her tiştî dikin mijara neteweperestiyê. Wekî vê destanê, asayî ye ku civakên mirovan tiştekî feydaya xwe gihaştiya civaka wan pîroz bibîne. Ew ne kêmasî yan jî şaşîtiyeke wî gelî ye. Faşîzma modernîteya kaptalîzim wisa lê dike. Çanda gelekî, dîroka hozekê dike mijara nijadperestiya xwe.

Werhasil, îro jî Dewletê şirîkê Erdogan ku di baxçeyê faşîzmê de aqil û hişê wî tevlî hev bûye jî ew ‘gurê boz’ ku dizûre ji xwe re kiriye al û bi hawara faşîzma kesk a AKP’ê ve hatiye. Na, bila şaş neyê fêmkirin. Bi rastî jî gur heywanekî wisa ye ku ji zindiyên herî serbilind e. Hûn ê bêjin çima? Ji ber ku koletiyê nizane, serî natewîne... Lê belê dema ku bû sembola nijadperestiyê, dibe celadê gelê Kurd, gelê Ermen û heta gelê xwe bi xwe...

Em vê destana gurê boz û Bahçeli li vê derê bihêlin, werin li ser dest destaneke din: Şerê Hz. Îbrahîm û Nemrût... Mijar maarûf e, tê zanîn. Li vî welatî û heft aliyên cîhanê ti kesê nebihîstî û nizane tine. Werhasil, çarenûsa Nemrût jî wisa bi dawî dibe:

Li gorî hin rîwayetan, rojekê pêşiyek dikeve mejiyê Nemrûtê dijminê Hz. Îbrahîm. Ev pêşî xwe li wir jî nagire, digihîne mejiyê wî û jê re dibe êşeke nedîtî. Nemrût loqman hekîmên heftê û heft welatan banî ber lingê xwe dike ku jê re dermanekî peyda bikin. Ti kes jê re nabe çare. Di dawiya dawî de yek jê re rêyekê salox dide. Dibêje, “şivekî ji hesinî, baş bi hiriya pêz bipêçîne û pê li serê xwe bide da ku êşa serê te bibire”. Nemrût wisa dike, êşa di serê wî de hinekê kêm dibe. Ji xwe re difikire û dibêje, “madem serê min wisa hinekê rehet bû, ez vê carê kilavê li ser şivik pêçandî rakim, dibe ku hê serê min rehetir bike.” Bi rastî jî kilavê li ser şivê hesin pêçandî radike, destpêkê hêdî hêdî pê li serê xwe dide. Serê wî hineke dîtir rehêt dibê. Dê, dê, dê û dê... Dibîne ku serê wî xweş dibe. Ji nişka ve bi hemû hêza xwe, bi hesinî li serê xwe dide û aql û qeloxa serê xwe parçe parçe dike.

Gurê me yî boz (Bahçeli) jî ketiye vê ortalixê (meclisa mezin a Tirkiye) dibêje “Tirk neçar in ji Kurdan hez bikin, Kurd jî neçar in ji Tirkan hez bikin.” Yê din (serokê CHP Özel) “Ka werin em Kurdan bikin xwediyê vê dewletê.” Yan van hişê xwe xwariye yan jî wekî Nemrûtê rahmetî pêşiyek ketiye mejiyê wan. Na, hema em zû baweriya xwe bi van Nemrûtan neynin! Dibêje “dekûdolab û leystokên Osmanî xelas nabin!” Eger ne leyistok be, tê maneyê ku van mirina xwe di xewna xwe de dîtine. Yan jî pêşiyek ketibe mejiyê wan! Dibe, ev der Kurdistan e. Her der çem û kanî ne. Jê kêmtir jî avzem in. Tije pêşî ne. Ne stepên Asyaya Navîn in. Ma çi karê gur û çeqelan li vê derê heye?

Çima me şibandineke wisa kir? Lewra serokê İyi Partiyê di meclisa Tirkiyede êrîşê Bahçeli kir. Digot, “te berê bi benê îdamê qala Abdullah Ocalan dikir. Te pê nekarî. Te karîbû hêviyên miletê Tirk daliqanî.” Û benê ku bi rastî jî, berê Bahçeli ji bo Rêber APO dihejand, avêt nav çavên wî.

Bahçeli çi kir? Ew benê serokê İyi Parti jê re avêtî, bir meqama xwe. Hûn ê bêjin çi jê kir? Bi odaya xwe ve kir. Wekî ku îdam bike (dihate wê maneyê) remza İyi Partî jî pê ve kiribû. Di rastiyê de yek ji yê din faşîstir e lê dibe ku pêşiyek (tirsek-fikarek) ketibe mejiyê wan. Dîrokê careke din xwe dubare dikir, pêşiya ku bi hezaran sal berê ketibû serê Nemrût, ketibû Meclisa Mezin a Tirkiyê, ketibû nav mejiyê Bahçeli; hem jî di ber re dengê hesinî re ku ji TUSAŞ’a Enqereyê dihat.



# ‘Dagirkeriyê 21 milyon dar birîne û 9 hezar kes revandine’

Rêveberê Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê, Ibrahîm Şêxo da zanîn ku dewleta Tirk û komên çete ji destpêkirina dagirkirina Efrînê ve heta niha 21 milyon dar birîne û 9 hezar welatiyên resen binçav kirine. Herwiha Şêxo dest nîşan kir ku dagirkerî nahêle welatî berhemên xwe rakin û budceyên mezin li ser wan ferz dike.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Tevlîheviya ku dewlteta Tirk a dagirker di herêmên dagirkirî de, pê re jî pevçûna di navbera komên çeteyan her û her di rojevê de ye, piraniya caran bi zanebûn tên kirin. Gelek komên çete li piştperdeya van pevçûnan disekinin, ji ber ku hin ji wan koman serwer dibînin ku eger êrişên bejayî yên Tirkiyê çêbibin wê ew bêbandor bimînin. Encam jî ew e ku pilanên dewleta Tirk a dagirker di piratîkiyetê de pêk tên, pê re jî binpêkirin û sûncên şer ên dijmirovî rûdidin. Şer û pevçûna domdar di navbera Cebhet Elnusra û çeteyan de ye , bi taybet koma Ehrar Elşam. Cebhet Elnusra jî hêzeke mezin û bingehîn e ji bo dagirkeriya Tirk. Şer û pevçûna di navbera komên çete û Elnusra de çêdibe, bi pilangêriya Tiriyê û mîta wê ye. Eger komeke ji komên çete, ne li gorî ferman û pilanên dagirkeriyê tevgbigerin, wê Elnusra weke amûreke zextê li hemberî komên din were bikaranîn. Li hêleke din jî bi sedema dizî û wêrankirina mal û milkên welatiyên resen ên herêmên dagirkirî, şer di navbera çeteyan de çêdibe.

**Human Raghts Watch kiriyarên dagirkeriyê bi belge kirin**

Berî çend mehan Saziya Navnetewî ya Çavdêriya Mafê Mirovan (Human Rights Watch) raporek têkildarî binpêkirinên ku dewleta Tirk a dagirker li deverên dagirkirî dike, belav kir. Raporeke berfireh bi 75 rûpelên belgekirî girêdayî rewşên weke revandin, binçavkirina bêsedem, îşkencekirin û tundiya cinsî, bû. Di raporê de hatibû destnîşankirin ku ev binpêkirinên dijmirovî ji hêla komên çete mîna Cêş Elwetenî ve hatine kirin. Cêş Elwetenî jî bi destên dewleta Tirk a dagirker di 2018’an de hatiye damezirandin. Rêxistina Watch tekez kir ku ev kom bi serweriya Mîta Tirk rasterast komkujiyan pêk tîne. Heman rêxistinê bi belgeyan dest nîşan kir ku binpêkirin di derheqê welatiyên resen û milkên wan de hatin kirin. Di heman demê de rewşên talankirin û wêrankirina berfireh ji mal û milkên gelên herêmên dagirkirî re çêbûn. Derbarê kiryarên dagirkeriya Tirk li ser Efrînê rêveberê Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê, Ibrahîm Şêxo ji rojnameya me re axivî.

**‘Nakokiyên di navbera komên çete de ji ber pereyan e’**

Şêxo da zanîn ku şerê di navbera komên çete de çêdibe ji ber budceyên ku her komek li ser welatiyan feriz dike ye û wiha axivî: “Nakokiyên di navbera komên çete de, ne ji ber sedemên îdiyolojîk û mezhebî ne, lê belê ji ber dabeşkirina budceyan e. Ji ber budceyên ku li ser darên zeytûn, guvaştgeh, kargeh û deriyên sînorî dikevin, şer di navbera wan de rûdide. Di encama van şeran de jî şêniyên resen rastî astengiyên jiyan dibin. Jiyan li wan herêman dibe mîna sîstema daristanê, kesê hêzdar ê bêhêz dixwe û hemû kiriyar jî di bin serweriya dagirkariya Tirk de pêk tên. Binpêkirin di çarçoveya mêtengariya madî yan jî koçkirina bi darê zorê de pêk tên. Ji ber vê yekê em dibînin ku piştî binçavkirina kesekî/ê ew ji malbata wî an wê, li hemberî biryara berdanê jî pereyên gelek dixwazin. Tewana binçavkirinê jî hertim amade ye, ew jî ku bi Rêveberiya Xweser an jî Hêzên Sûriyeya Demokratîk(QSD) re têkildariyê dike.”

**‘Dagirkeriyê 21 milyon birîne û 9 hezar kes revandine’**

Ibrahîm diyar kir ku dagirkeriya Tirk û komên çete heta niha 9 hezar kes bin çav kirine herwiha 21 milyon dar birîne û wiha got: “Birîna daran û xerakirina daristanan jî yek ji rêbazên binkirinan e, di encamê de 21 milyon darên ku li ser 39 hezar hektaran hatine çandin, hatin birîn. Armanca dewleta Tirk ji birîna daran jî ew e ku kampên mêtingeriyê ava bike. Hejmara kampên mêtingeriyê di dema heyî de 45 in, da ku pêla koçberkirina kesên ku hîna li ser axa xwe mane zêde bibe, hîna jî kiryarên birîna daran û avakirina kampên mêtingeriyê berdewam in. Li nik vê yekê jî ji destpêka dagirkeriyê ji sala 2018’an li ser Efrînê heta niha zêdetirî 9 hezar rewşên revandin û desteserkirinê çêbûne. Ji wan hezar jin û bi sedan zarok hene ku gelek ji wan bi berdêla bi hezaran dolaran hatine berdan. Li gorî yasaya Romayê ya sala 1998’an û madeyên 6-7-8, ev hemû binpêkirin jî dikevin çarçoveya tawanên li dijî mirovahiyê û tawanên şer.”



**‘Dagirkerî û komên çete nahêlin welatî berhemên xwe rakin’**

Rêveberê Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê, Ibrahîm Şêxo dest nîşan kir ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê nahêlin ku welatiyên resen berhemên xwe rakin û wiha domand: “Kesên li wir bi cih bûne û komên çete dest bi diziya berhemên welatiyan kirine. Herî zêde komên weke Elhemzat û Emşat şêniyên resen ên ku dikevin bin serweriya wan de ne, li hev kom kirin ji bo ku budceyan li ser wan ferz bikin. Lewma jî li ser her dareke deverên çiyayî 8 dolar hat destnîşankirin û ji bo her dareke deverên deştî 30 dolar hat ferzkirin. Cêş Elwetenî bi hemû cureyên dijmirovî binpêkirinan di derheqê welatiyên resen de pêk tîne, di serî de gelê kurd li Efrînê. Herî dawî ji van binpêkirinan, ew bû ku komên çete pereyan li ser jêkirina berhemên zeytûnan distînin û ev yek jî ji 15’ê Cotmehê dest pê kir. Komên çete dest bi daneheva budceyan ji welatiyan kir berî ku berhemên xwe rakirin.

## Divê mirov ji pêşerojê qut nebe



**Zekî Bedran**

Gotareke ku di rojnameya Şarkul Avsat de hatibû parvekirin di derheqê rewşa gelê Sûriyê de, ya ku di nav de ye nirxandinek hebû. Wek tê zanîn berê digotin ‘’Bê Sûriyê şer bê Misirê jî aşitî nabe.’’ Niha jî şerên ku di Rojhilata Navîn de didomin tê de navê Sûriyêyê derbas nabe. Ruxmê ku axa wê her tim ji alîyê Îsraîlê ve tê bombebarankirin. Ji aliyê din ve dagirkerî û êrîşên Tirkiyê jî nasekine. Kiryarên ku hukumeta Sûriyê dike jî bêdengiya xwe parastin e. Ev gotara ku qala wê tê kirin, ev pêşveçûn çawa diteyise gel wê dinirxîne. Îsraîl deriyê sînorê Lubnan û Sûriyê bombebaran dike û bi wan bûyeran dixwaze heremên ku tê de şer didome de gel bide revandin û bêhêvîbûnê kûrtir bide jiyan kirin. Gotar dide xuya kirin ku gelên Sûriyê ketiye rewşeke wisa ku ji ber pirsgirêkên jiyanî yên rojane êdî nikare di derheqê pêşeroja welat de bifikire û bikeve tevgerê. Gel erkên xwe yên welatparêziyê daniye aliyekî, di derheqê pêşeroja xwe de nikare bifikire. Ya ku pêşeroja wê diyar dike jiyana wê ya rojane, dîtina nan, şewat û mal e. Gelekî ku ketiye vê rewşê ne dikare liberxwe bide û ne jî tê rêxistinbûyin ê.Mîsogere ku ketina vê rewşê ya gelê Sûriyê de erka pergala yek partitîyê û BAAS’ê mezine. Divê ev mijar jî were lêkolîn kirin. BAAS naxwaze gel bifikire û xwe rêxistin bike. Ji bo mijara wan ya bingehîn serwerî û mêtîngerî ye. Gelê ku bifikire û xwe rêxistin bike ji bo pergala xwe xeter dibînin. Hemû amûrên propagandayê di destê dewletê de ye. Dewlet jî destê BAAS’ê de ye. Di vê rewşê de perwerdeya gel, axaftin û parvekirina fikran li gorî berjewendiya deshilatdariyê derbasdar e. Cihê gel jî deshilatdar diaxive, biryar dide. Di pratîkê de axaftin û fikirandin ji gel re hatiye qedexekirin. Li gor rêveçuyinê nerihetiyê xwe anîna li ser ziman û di çapemeniyê de fikrekî birexneyî diyar kirin ne mîsoger e. Xwestekeke ku demokratîk an jî sekneke muhalif ji aliyê desthilatiyê ve nayê pejirandin. Yên ku vana bikin an di girtîgehan de dirizin, diperçiqin an jî têne mecbûr kirin ku birevin derveyê welat. Di pergala BAAS’ê de gel avêtine derveyê polîtîkayê. Pergalê gotiye ku ‘’Polîtîkayê, rêxistinê û fikirandinê ji me re bihêlin, biçin pirsgirêkên debara xwe ve mijûl bibin.’’ Dîsa gendelî, dizî û hwd jî ji rêzê bûye. Yên erkdar cihê ku ji gel re xizmet bike ew jî vegerandiye pereyan. Gel elimandine vê. Dema ku rêxistinbuyin û lêgerîna mafan tê qedexe kirin gel jî ji bo ku karê xwe bi rêve bibe neçar dimîne ku bibe perçeyekî pergala ruşvet û dizî yê. Ango ruşvet û dizî vegeriye çandekî.

BAAS bi propagandaya netewperestiyekî çors û lêgerînên hemû mafan û seknên mûxalîf wek lîstokên hêzin derve pênase dike û bi vê ve gel ditirsîne û zanebûna wan berovajî dike. Sûriyê niha hatiye talan û wêran kirin. Sedhezaran însan hatin kuştin û milyonan jî bûn penaber. Lê hukumeta Şamê û evê ku welat rêve dibin tu carî xwe wek berpirsyarên vê nabînin. Rexnedayîna wan nehat dîtin. Tê gotin ku hemû xerabî û wêranî planên hêzên derve û dijminên Sûriyê ne. Ev tê propaganda kirin. Lê belê çima mîlyonan Sûriyêyeyî tevlî van buyeran bûn di vê de paya me çiye nabêjin. Napirsin ku çima di welatên din de ev weranbûn çênabin û naxwazin ev jî were pirs kirin. Lê belê hejmara ku kesên li dijî vê hukumetê çek rakirin û daketin qadan milyonan bû. Evana ji derve nehatîbûn. Vana di dibistanên Sûriyê de xwendibûn û li Sûriyê jiyan kiribûn. Dema buyeran rû da gelek hêz tevlî bûn, xwestin tevlîhev bikin û welatên wek Tirkiyê sînorên xwe ji hêzên wek DAIŞ û El Nusra’yê re vekirin. Ên ku hêza wan hebû û xwestin ku bikevin Sûriyê ketinê. Ev jî di encama lewazbuyîna hukumetê bû. Wek tu tiştek nebuye ku hê jî deshilatdariyê ne û nafikirin ku biguhurin jî. Ger ku Îran û Rusya nebuya hêza wê ya li ser piya mayinê nebû. Xwe bi kopalan ve li ser lingan digre û ruxmê vê jî xwe naguherîne.

Rêveberiya xweser pergaleke pir cûda ava kir. Hemû gel, bawerî û çand di bin sîwanekê da kom kir. Di nava vê howîtîyekê de wek zêvîya (vaha) demokrasî û azadiyê derket holê. BAAS û dagirkeriya dewleta Tirk ji bo ji holêrakirina vê çi ji destê wan tê dikin. Ji bo Rêvebiriya Xweser jî xeterî û metirsî zêde ne. Li dijî vana ji bo Rêveberiya Xweser Referansa rast li pêşiya her tiştî rêxistin kirin hişmendîya rast ya gele. Di Rojava de, Bakur û Rojhilarê Sûriyê de wek jor jî me anî li ser ziman xeteriya xeniqandina gel ya di nava pirsgirêkên jiyanî yên rojane mayînê heye. Dewleta Tirk bi êrîşan û lêdana çavkaniyên jiyanî ve dixwaze gel polîtîqayê, welatparêziyê dûr bixe û wan di nava pirsgirêkên jiyanî de bixeniqîne. Li ser vê esasê divê him Rêveberiya Xweser û him jî gel vê xeterîyê bibîne, qedera xwe bi xwe diyar bike. Pêwîst bike dê di nava tunebûnê de tî-birçî bimîne lê tu demê dev ji ax û azadiya xwe bernede.

## Têkoşîna Yusuf Ziya û Abdullah Ocalan



**Farûk Sakik**

Em ê di vê nivîsê de behsa dagirkirina Şaredariyên Mêrdîn, Batman û Xelfetî nekin. Ev biryara AKP-MHP’ê bi serê xwe nîne. Siyaseta dewletê ya dijminatiya Kurda ye.

Em ê derbasî sed salî berê bibin û behsa nîqaşên di pêvajoya Peymana Lozanê de, li Meclisa Enqerê dihatin kirin, bikin. Em ê behsa Yusuf Ziya bikin. Ka Bahçelî di “konferansa Ziya Gokalp” de navê wî û helwesta wî zikir kiribû ya, em ê jî behsa wê rojê bikin. Bahçelî behsa axaftina Yusuf Ziya di pêvajoya Lozanê de nîqaşên li ser Mûsilê dikir. Qetilkirina wî ji bîr kiribû.

Di nîqaşên Lozanê de, Lord Kûrzon dibêje, “Mebûsên Enqerê ji aliyê Mustafa Kemal ve hatine bijartin, lewma ew nikarin Kurdan temsil bikin.” û bi vî awayî îngilîz tu şiklî dev ji Mûsilê bernadin. Lewma hîn mebûsên Kurd bersivê didin Lord Kûrzon ku ji van mebûsan yek jî, Yusuf Ziya ye. Yusuf Ziya, ji heyeta Tirk dixwest ku di hevdîtinên Lozanê de ew ti carî qebûl nekin ku Rojava û Başûrê Kurdistanê ji Tirkiyê bê veqetandin. Lewra ew xaka Kurdan e û Kurd û Tirk jî bira û xwedî heman qederê ne. Îngilîzan pêşniyariyek ji tirkan re anîn: Bi şertê ku eger tirk li Kurdistanê otonomiyê îlan bikin, ew ê jî, ji Mûsil derkevin. Lê tirk ji bo otonomiyê nedin kurdan, Mûsil dan îngilîzan. Ji xwe derdê îngilizan Kurd nebûn, petrola Mûsil û kerkûkê bû. Ku wê demê wîlayeta Mûsil tevahiya Başûrê Kurdistan di nav sînorê xwe de dihewand.

Di 27’ê Sibata 1923’yan de, di civîna girtî a meclisê de gava Îsmet Paşa biryara peymana Lozanê ya ku Mûsil ji îngilîzan re dihişt xwend, di serî de Yusuf Ziya mebûsên kurd li dijî biryarê derketin û gotin, “Heta niha em difikirîn, ku kurd û tirk ew ê pirsa kurdî bi hev re di şerê li dijî dewletên emperyalîst de çareser bikin. Lê niha, ji gava ku hikûmeta Tirkiyê razî bû wê Mûsilê bide ingilîzan, hemû hêviyên me têk çûn. Divê kurd ji îro pê de qedera xwe bi destê xwe tayin bikin.” Piştî ku ev hêvî têkçûn hetanî roja me kurd bi dû hêviyek wusa neketin. Kurdan Tirkan baş nas kiribûn. Ji bilî berxwedan û serhildanan tu rêyek li pêş wan nemabû. Hêviyên xwe ji Tirkan û ji hêzên derve jî qût kirin. Serhildanan dest pê kir û Yusuf Ziya di serdema serhildana Şêx Seîd de hat darvekirin. Geşedanên îro û konjoktura demê dişibin hev. Dîsa şerek cîhanî. Dîsa hêzên emperyal li qada Rojhilata Navîn û dîsa Kurd û axa Kurdan di vî şerî de faktorek girîng e. Dîsa Erdogan-Bahçelî (Înonu û Ataturk) li ser Kurdan bazariyan dikin. Bahçelî û Erdogan li ser navê dewletê diaxivin û behsa Sewra serdemê (metirsiya şerê Îsraîlê) dikin. Ji Ocalan (Yusuf Ziya) hevkarî dixwazin. Yusuf Ziya piştî firotina Mûsilê ya digot; “Gava ku hikûmeta Tirkiyê razî bû Mûsilê bide ingilîzan, hemû hêviyên me têk çûn. Divê kurd ji îro pê de qedera xwe bi destê xwe tayin bikin”, Rêber Apo, ev axaftin bi dehan caran xwendibû. Bawerî anîbû û ji cihê ku têkoşîna Yusuf Ziya nîvco hiştibû destpêbike. Û wisa kir.

Axaftinên Bahçelî yên pesindayina Yusuf Ziya (pêvajoya Lozanê) bi dagirkirina şaredariyên gelan-04.11.2024 (wek pêvajoya firotina Mûsilê) niyeta Tirkan da îspatkirin. Ew li bendê bû ku Rêber Apo wek Yusuf Ziya (peyama ‘qedera Kurdan û Tirkan yek e’) peyamek bide. Lê Rêber Apo ev yek red kir. Ji bo vê jî got; “tecrîd dewam dike” (Hevdîtina Omer Ocalan, encamê ‘pêngava Azadiya Ocalan’ bû)